



## Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2020  
Sayı/Hejmar/Issue: 1  
Sayfa/Page: 83-103



# WERGERA JI TIRKÎ BO KURDÎ Û BIKARANÎNA HIN PEYV Û QALIBÊN GIRÎNG ÊN KURDÎ DI WERGERÊ DE

Zafer AÇAR

## KURTE

Wergere yek ji girîngtirîn çalakîyên însanan e ku bi xêra wergerê ji zimanekî bo zimanê din agahî tîn guheztin bi mebestên cuda. Ji bo ku mantiqê zimanan carna wekî hev an jî nêzî hev û carna jî dûrî hev in bi rêya wergerê digel agahiyên pêdivî çand û şaristaniya civakan bi rêya zimanê wan tîn hînbûn.

Wergera ji Tirkî bo Kurdî, xusûsen jî sedsala dawî, her di jiyana kurdan de bûye ku îro wekî babeteke sereke ya qise û gengeşiyane. Ji bo ku wergereke baş bê kirin, bi taybetî jî di hevokên kompleks û yê dirêj de; navdêrandinên Tirkî, daçek û gihanekên wê divê baş bê zanîn û berdêlên wan ên Kurdî divê rast bîn bikaranîn.

Dema ji Tirkî bo Kurdî wergere hat kirin, çî di axaftinê çî jî di nivîsandinê de be li gorî hevok an jî îfadeyan divê berdêlê wan ên Kurdî lê werin. Armanca vê xebatê ew e ku nimûneyên wergera hin hevok û qalibên ji Tirkî bo Kurdî pêşkeş bike. Dîsa digel hin nimûneyên devokî, lêkernav, hin daçek, gihanek û peyvên alîkar ên Kurdî di wergerandina ji Tirkî bo Kurdî de nîşan bide û bi van nimûneyan têkariya vê biwarê bike.

Ev xebat serî de bi kurtasî çî dide pênaseya wergerê, hin xusûsiyetên herdu zimanên Kurdî û Tirkî, paşê jî hin hevok û qalibên nimûne yê Tirkî û beramberî wan ên Kurdî pêşkeş dike. Divê ev jî bê gotin ku hin nimûneyên ji bo wergerê hatine bijartin ji berhemên muxtelîf hatine wergirtin.

**Peyvên Sereke:** Wergera ji Tirkî bo Kurdî, Hevokên Kompleks, Gihanek, Peyvên Alîkar

83

Article Types / Makale Türü:  
Research Article / Araştırma Makalesi  
Received / Makale Geliş Tarihi: 30.04.2020,  
Accepted / Kabul Tarihi: 30.04.2020  
Dr., (MEB), zafer13acar65@gmail.com  
ORCID ID: 0000-0001-5323-95313  
DOI: 10.5281/zenodo.3895077

Atf: Açar, Z. (2020). "Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîng ên Kurdî di Wergerê de". Kurdiyat, 1, 83-103  
Citation: Açar, Z. (2020). "Translation From Turkish to Kurdish and Using Some Kurdish Words and Phrases in Translation". Kurdiyat, 1, 83-103

## Türkçeden Kürtçeye Çeviri ve Bazı Kürtçe Söz ve Kalıpların Çeviride Kullanımı

### ÖZET

Çeviri farklı amaçlarla bir dilden başka bir dile bilgi aktarımına olanak sağlayan en önemli insan etkinliklerinden biridir. Dillerin mantığı bazı durumlarda aynı veya benzer olmakta, bazen birbirine yakın özelliklere sahipken bazen de farklı olabildiği için çeviri eylemi sayesinde, bir dilden başka bir dile gerekli bilgilerin aktarılmasıyla beraber toplumların sahip olduğu kültür ve medeniyet de bu yolla öğrenilebilmektedir.

Türkçeden Kürtçeye çeviri, özellikle de son yüzyılda, her zaman Kürtlerin hayatının ayrılmaz bir parçası olmuştur ve bugün önemli bir tartışma konusudur. İyi bir çeviri için özellikle de kompleks ve uzun cümlelerde Türkçedeki fiilimsiler, edat ve bağlaçların iyi bilinmesi ve Kürtçedeki karşılıklarının doğru konulması lazımdır.

İster yazılı olsun ister sözlü olsun, Türkçeden Kürtçeye çeviri yapıldığı zaman, çevirilen cümle ve ifadelerle göre Kürtçe karşılıklarının uygun olması lazımdır. Bu çalışmanın amacı bu cümle ve ifadelerden örnekler sunmak, kimi şivesel örnekleriyle beraber Kürtçedeki bazı fiilimsi, edat, bağlaç ve yardımcı kelimelerle Türkçeden Kürtçeye çeviriyi örneklendirerek bu alana katkıda bulunmaktır.

Bu çalışma öncelikle; kısaca çevirinin tanımına, Kürtçe ve Türkçenin bazı dilsel özelliklerine yer vermekte, daha sonra Kürtçe karşılıklarıyla beraber bazı örnek Türkçe cümle ve kalıpları sunmaktadır. Ayrıca şunu da belirtmek gerekir ki, bu çalışmada kullanılmış olan örnek bazı cümle ve kalıplar muhtelif eserlerden seçilmiş ve örneklendirme yapmak amacıyla kullanılmışlardır.

**Anahtar Sözcükler:** Türkçeden Kürtçeye Çeviri, Kompleks Cümleler, Bağlaç, Yardımcı Sözcükler

## Translation From Turkish to Kurdish and Using Some Kurdish Words and Phrases in Translation

### ABSTRACT

The translation is one of the most important human activities that enables the transfer of information from one language to another for different purposes. Because the logic of languages can sometimes be the same, sometimes close or different, thanks to translation, the culture and civilization of the societies together with the necessary information can be learned in this way.

Translation from Turkish to Kurdish, especially in the last century, became inseparable part of the lives of the Kurds' and it is a important debate in our present day. It is essential to know gerundials, prepositions and conjunctions in Turkish well, especially in the long and complex sentences, and use their meanings in Kurdish for a good translation.

When translating from Turkish to Kurdish, whether writing or verbal, according to translated sentence and expression, their Kurdish equivalents must be appropriate. The aim of this study is to provide examples from these sentences and expressions, and to contribute to this field by exemplifying the translation from Turkish to Kurdish with some phrasal, prepositions, conjunctions, and auxiliary word in Kurdish along with some examples.

This study is primarily; briefly, it contains the definition of translation, some linguistic features of Kurdish and Turkish, and then offers some examples of Turkish sentences and patterns with their Kurdish equivalents. It is also worth noting that some sentences and patterns used in this study were selected from various works and used for sampling purposes.

**Keywords:** Turkish to Kurdish Translation, Complex Sentences, Conjunction, Auxiliary Words

## DESTPÊK

Werger bi pênaseyeke basît, wergerandina metnekê ji zimanekî bo zimanekî din e. Wekî ku Newmark jî dibêje werger “piranî her gav tam ne wisa be jî, veguheztina wateya metnekê bo zimanekî din e ya ku nivîskar wê dixwaze”.<sup>1</sup> Wergêr çî bi devkî çî jî bi nivîskî be, dema metnekê ji zimanekî vediguhêze zimanekî din ew karê wergerandinê dike. Karê wergerê bi çend cureyan tê kirin ku Jacobson wî wekî; nav-zimanî (intralingual), navbera zimanan (interlingual) û nav-nîşanekî (intersemiotic) dike sê kategoriyan.<sup>2</sup> Xebata me, ji van cureyan têkilî wergera navbera zimanan e; wergera ji zimanê Tirkî bo zimanê Kurdî.

Eslê peyva *wergêr* digihêje ferhengeke Siryanî ya berî mîladê 4000 salan<sup>3</sup> ku ew paşê dikeve zimanên din jî. Însanan ji ber kar û ihtiyacên xwe ji demên berê vir de hem bi devkî hem jî bi nivîskî werger kirine ku îro werger êdî wekî dîsîplîn û zanistekî derketiye der. Di dîroka mirovahiyê de karên brokratik ên dewletê, pêşketinên zanistî, rasthatinên çand û şaristaniyên nû, rê ji wergerê re vekirine. Di alema Îslamê de metnên ji yewnanî û latînî hatine wergerandin, li Rojava wergera Încîlê bo almanî guherînên muhîm deranîne.

Di Kurdî de wergerandin digihêje heta sedsala 18an ku ew jî zêdetir bi xebatên kurdolojiyê re eleqedar e. Cara pêşîn kitêba ku ji zimanekî din bo Kurdî hatiye wergerandin Încîlek e ku ew bi elifbêya ermenî di sala 1856an de li Stenbolê hatiye belavkirin û ji aliyê waîz Stephan ve li Diyarbekirê bo Kurdî hatiye wergerandin.<sup>4</sup> Piştî vê wergera Şerefnameyê ji farisî bo Kurdî ji aliyê Mela Mehmûdê Bazidî ve hat kirin û wergerandina metnên nivîskî her berdewam kir.

Di sedsala 20an de, jiyana kurdan wekî jiyaneke duzimanî yan jî pîrzimanî bû ku vê rewşê digel aliyên xwe yê erênî; ‘hînbûna zimanekî din, kardîtin, pirçandî û ww.’ aliyên xwe yê nerênî ve jî xwe nîşan kir ku kurdan mihtacî ziman û çandê din kir. Li Bakurê Kurdistanê Kurd geh bi rêya cîranên xwe yê Tirk geh bi rêya mekteb û sazîyên fermî geh jî bi rêya -van demên dawî- teknolojiyên wek; radyo, telefon, televîzyon û înternetê; bêgav hînî Tirkî bûn.

Li Tirkiyeyê hînkirina zimanê Tirkî girîngtirîn kar e di dibistanên dewletê de ku em ji bo hînkirina zimanekî biyanî nikarin eynî tiştî bêjin. Ji bo ku Tirkî baş bê fêrkirin ji kreşan heta zanîngehê Tirkî mecbûrî ye û di dibistana seretayî de jî; ji pola yekem heta ya çarem heftiyê de heşt saet e ku heta berî çend salan jî ew heftê de duwazde saet bû. Herwiha zimanê vegotina dersan jî, ji bilî hin dibistanên taybet, hin dersên biyanî û hinên bijartî yekser Tirkî ye.

Ji ber ku du zimanên cuda ne kurdan gelek çaran axaftina xwe ya Kurdî ji bo ku heval û derdora wan ên Tirk fêr bikin wergerandine Tirkî. Herwiha wan dema ji Tirkî fêr nekirine û mecbûr mane fêr bikin bi rêya wergêrekî/ê yan jî -eger kêr zêde wî zimanî zanibin- bi rêya şablona wergerê ya zêhna xwe xwestine wî zimanê biyanî fêr bikin ku ev rewş mijareke sosyopsîkolojîk e û ji sînor û babeta vê xebatê der e.<sup>5</sup>

Di wergera nivîskî de jî, kurdan ji Tirkî werger bo Kurdî kirine ku vê rewşê bandor li hizra Kurdî ya akademîk û rewşenbîrî kiriye. Ji ber xwendin û nivîsandina Tirkî û wergerandina ji Tirkî ye ku dema hinek Kurd zimanê xwe hîn bûne, gelek çaran li gorî qaîdeyên zimanê Tirkî werger kirine ku îro ev şaşîtî dibin babetên lêkolînan.

Berhema ewil a ku ji Tirkî bo Kurdî hatiye wergerandin, li gorî agahiyên berdest, helbesteke Mehmet Akif Ersoy e ku ji aliyê Modanî X. hatiye wergerandin û sala 1913an, di rojnameya Rojî Kurd de hatiye weşandin.<sup>6</sup> Piştî hingê ji ber ku sîstem û sazûmana dewletê kurd û Kurdî li derve hîştine, rê li ber girtine û kurd mecbûrî Tirkî kirine, kurd bêgav mane berê xwe bidine hînbûn an jî

serwextbûna Tirkî. Di wergera Kurdî bo Tirkî de jî; di vê sedsala dawî de, bila çend dehsalên dawî ne têde be, kêr xebat hatine wergerandin.

Em ê di vê xebata xwe de hin hevokên Tirkî yên kurt, dirêj, yên dîyalogan, yên ku biwêj û gotinên pêşiyên di hewînîna wergerînîna Kurdî û balê bikişînîna ser awayê wergerandina wan. Herwiha ji bo ku em berdêlên wan nîşan bidin em ê hin daçek û gihanekên Tirkî wergerînîna Kurdî. Dîsa em ê nimûneyên hin daçek û gihanekên Kurdî û hin peyvên alîkar ên wekî gihanekan tîna bikaranîna bidin. Lê berî ku em derbasî nimûneyên xwe bibin divê em pêşiyê diyar bikin ka em çima wegerê dikin, çawa dikin û zehmetiyên wê çî ne.

Wekî ku tê zanîn çî ji ber îhtiyacan be çî jî bi daxwazî be karê wergerê karekî girîng e û gelek fêdeyên wê hene di jiyana însan de. Bi xêra wergerê em ast û exlaqê medeniyetên din nas dikin. Çandên nêzik an dûr nas dikin. Bi awayekî din difikirin. Ji ber ku mantiqê zimanan cuda ne bi riya wergerê em dibin xwediyê mantiqên cuda û dikarin bi çavekî din binêrin. Bi rêya wergerê mirovahî bi hest, nêrîn û ramanên hev dihise; ji hev fêm dike. Zimanê gelan jî dîsa bi rêya wegerê şax dide.<sup>7</sup>

Îja, ji bo wergerê bê kirin hin usûl û pêlik hene divê ew bêne şopandin. Dema wergerekê bê kirin divê pêşî metna wergerê bê bijartin. Newmark, metnan wekî edebî-ne edebî dike çar tîpan; vegêrranî (narrative), danasînî (descriptive), metnên raberiyê (discussion) û yên diyalogê (dialogue).<sup>8</sup> Cureya metnê girîng e çunkî li gorî cure û naveroka metnê rê û rêbaza wergerê dikare biguhere. Bo nimûne, wergera diyalogan li gorî metnên din bêtir serbest e û hemanên devokî dikarin zêdetir bêne bikaranîna di van metnan de.

Piştî ku metin hat bijartin, ji bo wergereke baş bê kirin divê bê zanîn ku hin şertên wergerê hene ku lêkolînerên vê biwarê ew nîşan kirine. Bo nimûne, Dolet hin prensîbên wergerê -wergera serbest- wiha rêz dike<sup>9</sup>:

Divê wergêr ji nivîsa nivîskar baş fêm bike, îfadeyên muxlaq rake.

Divê wergêr hem zimanê jêder hem jî zimanê armanc baş bizane ji bo ku îhtîşama zimên kêr neke.

Divê wergêr xwe ji wergera peyv bi peyv dûr bide.

Divê wergêr bikaranîna peyvên latînî<sup>10</sup> û formên cuda dûr bisekine.

Divê wergêr peyvên bi gunçawî bi hev ve girê bide.

Herwiha ji bo wergereke hevta (equivalent) Nida hin qaîde rêz kirine ku ew jî wekî li jêr in:<sup>11</sup>

Divê wateyekê bide

Divê rih û terzeke orjînal li ser hebe

Divê îfadeyê wê ya siruştî û hêsan hebe.

Divê bertekeke wekî ya metna orjînal bîne der.

Li ber ronayîya pêşniyarên li jor em dikarin bêjin metna ku em ê wergerînîna divê em baş bixwînin. Eger metin dirêj be em perçe perçe, paşê jî tewtî wergerînîna. Dema me hevok wergerandin em pêşiyê pêveber û bikera wê diyar bikin paşê em hevokê wergerînîna. Dû re divê ji bilî hevokên

7 Ayhan Yıldız, *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî -1*, 60.

8 Newmark, *A Textbook of Translation*, 13.

9 Yıldırımçakar, *Werger Wek Kirineke Çandî -Li Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdolojiyê Ve*, 9.

10 Mumkîne wê hingê qesta nivîskar; 'peyvên biyanî û yên nayên zanîn' bû.

11 Yıldırımçakar, *Werger Wek Kirineke Çandî -Li Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdolojiyê Ve*, 12-13.

kurt em hevokên dirêj bikarin saz bikin û qaîdeyê wan bizanibin. Herwiha ji bo wergera bikalîte divê em ji gîhanek, daçek, biwêj û gotinên pêşiyar baş sûd bigirin.

Li aliyekî din di karê wergerê de hin zehmetî hene. Wekî ku tê zanîn ji zimanekî bo zimanekî din wergera yekayek/peyv bi peyv ne mimkun e. Ji bo ku di navbera zimanan de hevtayîyeke tam tune, ev jî dike ku di wergerê de hin pêzanîn û hêmanên çandî û civakî winda bibin. Wisa tê ferzkirin ku peyvên hevta zêdetir di axaftina rojane de hene.<sup>12</sup>

Wergera axaftin û dîyalogan bi nîsbet ji wergera nivîsê rihettir e. Çunkî meydana û besta axaftinê ji ya nivîsê firehtir e. Di axaftin û dîyalogan de wergêr bêtir serbest e, dikare hin hêmanên deverî an jî devokî yê zimanê armanc di wergera xwe de bi kar bîne raber peyvên zimanê jêder. Lê zimanê nivîskî, sînorê wê diyarkirî, bi qayde û qalib e, loma karê wergêr hîn bi zehmet e.

Newmark behsa hevtayîya çandî, karîgerî û teswîrî dike û Bassnett jî çar cure hevtayîya wergerê ji Popoviç vediguhêze. Ev wekî; hevtayîya zimanzaneyî (di navbera zimanê jêder û yê armanc de wergera peyv bi peyv), hevtayîya rîsteyî (wekî hevtayîya hêmanên rêzimanî), hevtayîya şeweyî/stîlîstîk (wekî hevtayîya karîger a hêmanên zimanê jêder û yê armanc) û hevtayîya metnî (hevtayîya binyadî ya di metnê, wekî şeweyî û şekl).<sup>13</sup>

Eger li ser wergera nivîskî bê dewamkirin, di nivîsê de jî li gorî hevok û qaliban şeweya wergerê diguhere. Di hevokên xwerû, basît û metnên teknîkî de werger hêsantir e lê di hevokên kompleks û metnên fikrî, felsefî û helbestan de werger zortir e. Bo nimûne, ev hevokên li jêr dema ji bo zimanekî din tene wergerandin karê wergêr bêtir hêsan e:

Avê bide min.

Tasek av bide min.

Tasek ava zelal bide min.

Tasek ava zelal a Bîngolê bide min.

Tasek ava zelal a zozanên hênîk ên Bîngolê bide min.

Ev hevokên basît in ku yek lêker in û lêkernav û rûdanên din nînin. Lê heke em bixwazin hevo-keke kompleks saz bikin rûdan û lêkerên din jî divên. Îja ev xebat armanc dike ku ji zimanê Tirkî bo Kurdî nimûneyên hevokên kompleks, hevokên dirêj, hin qalibên cûredar nîşan bike ên standart ên Kurdî digel hin varyantên devokî.

### 1. Wergera Hevokên ji Tirkî bo Kurdî

Tirkî û Kurdî ji du komên cuda yê zimanan in ku herdu ziman jî xwedî xusûsiyetên cihê ne. Ew di sazkirina hevokan de jî, xweser jî hevokên kompleks, du zimanên cuda ne ku dema ji Tirkî bo Kurdî werger hat kirin divê navdêrandin bê fêmkirin û berdêla lêkernav, daçek û gihanekên Tirkî di Kurdî de rast bîn bikaranîn. Ji bo ku em mantiqa cuda ya herdu zimanan bibînin em li ser hevokekê bisekinin:

“ Ben kitabını aldım, okudum, arkadaşına verdim.”

Kitêb a kî/ê ye?

Zayenda ‘heval’ê çi ye?

Heval a/ê kî/ê ye?

12 İsmail Boztaş, “Çeviri, Çevirmen, Dilbilim İlişkisi, Çeviride Eşdeğerlik ve Kayıplar”, *Hacetepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*, 10/2, (Aralık 1993), 56.

13 İsmail Boztaş, “Çeviri, Çevirmen, Dilbilim İlişkisi, Çeviride Eşdeğerlik ve Kayıplar”, 56-57.

Em ê lêkera “almak” ê çawa wergerînin? (almak=girtin, standin, hildan, kirîn, wergirtin, hilgirtin)

Min kitêba te/wî girt, xwend û da hevala te/wî.

*Min kitêba te/wî girt, xwend û da hevalê te/wî.*

Herwiha di Tirkî de peyvên hevdeng gelek in. Bo nimûne, em li ser peyva ‘karşî’ bisekinin û bibînin bê çend cureyên wê dikarin di maneyên cuda de bîn bikaranîn:

O bana karşı çıktı. = Ew li ber min rabû.

Karşîdaki ev bizim evimizdir. = Mala hember/pêşber a me ye.

Büyüklerine karşı saygılı olmalısın. = Divê tu ji mezinê xwe re rêzdar/hirmetkar bî (Divê tu qedrê mezinê xwe bigirî).

Emeklerinizin karşılığını alacaksınız. = Hûn ê heqê keda xwe bistînin.

Karşımızda ne var henüz bilmiyoruz. = Em hêj nizanin bê çi li pêş me heye.

Onunla karşılaşacaksın. = Tu yê rastî wî/ê werî.

Bu dersimizde iki edebi eseri karşılaştıracamız. = Em ê di vê dursa xwe de du berhemên edebî rabeî hev/berawird bikin.

Li aliyekî din dema em bixwazin hevokê kompleks a ji çend lêker an lêkernavan pêk tê ji Tirkî wergerînin Kurdî divê em lêkernavên Tirkî binasin. Di Tirkî de -dikça/-dikçe, -diğında/-diğinde, -arak/-erek, -ması/-mesi, -an/-en, -ış/-iş/-uş/üş, -ıp/-ip/-up/-üp, -maz/-mez, -mak/-mek û wd. hene ku di Kurdî de beramberî wan lêkernav kêm in lê li şûna wan em; daçek, gihanek an hin peyvên bi kar tînin.

Di Kurdî de dema em bixwazin hevokên kompleks saz bikin divê em gihaneka *ku* û hin gihanekên wekî; *bê, ka, bê ka, hela* baş bi kar bînin.

### 1.1. Hevokên Kompleks

Hevokên kompleks ji hevokên hevedudanî ne ku hevokên hevedudanî ji darazekê zêdetir darazan dihewînin û wekî; ‘hevokên hevedudanî yên serbixwe’ û ‘hevokên hevedudanî yîn pevgirêdayî’ du cure ne.<sup>14</sup> Hevoka ku ji rûdan an jî lêkeran pêk hatiye wekî *hevoka kompleks tê zanîn*. Kompleksiya hevokê ne girêdayî dirêjahiya wê ye. Di hevoka kompleks de meriv behsa pîrbûna bûyeran dike, ne pîrbûna peyvên û dirêjahiya hevokê.<sup>15</sup> Em ê li jêr ji çend hevokên Tirkî mînakên digel wergera wan a Kurdî bidin û balê bixşînin ser lêkernavên Tirkî beramber lêkernav û gihanekên Kurdî.

#### 1.1.1. Gihaneka Ku

Gihaneka “ku” yek ji muhîmtirîn gihanekan e ku di Kurdî û zimanên îranî yên din de berbelav tê bikaranîn. “Ku” dema wekî gihanek hevokan bi hev ve girêdide ew wekî cînav kar dike. Di kurmanciya jorîn de wekî “ku”, di kurmanciya jêrîn de wekî “ke”, di zazakî de wekî “ke” tê bikaranîn. Ev gihanek di farisî de wekî; “هک یطبری فرح” herfî rebt “kê” tê zanîn. Di îngilîzî de, di hevokên hevalnavî (adjective clauses) di wateya gihaneka ku de; ji bo ku însan bîn wesifandin

14 Şerif Güzel, *Lêkolîneke Sentaksî li ser Berhema Camî'eya Risaleyan û Hikayetan* (Muş: Muş Alparslan, Enstituya Zanistên Cîvakî, Teza Mastirê, 2018), 97.

15 İbrahim Seydo Aydoğan, *Guman 1* (Ankara: Lîs, 2013), 124.

cînavên girêkî (relative pronoun) *who û that*, ji bo ku heywan, giya, bêcan bîn wesifandin *which* û *that* tên bikaranîn. Herwiha cînavên wekî *where, when, whom* di wateya gihaneka *ku* de tên bikaranîn. Dîsa di hevokên navî de (noun clauses) jî dema du hevokan bi hev ve girêdide *that şûna ku* digire.

Di hevokên kompleks yê pêreyî yê tamamker de hevoka sereke û hevoka pêreyî bi gihanekan bi hev ve têne girêdan. Gihaneka sereke ya ku di vî warî de tê bikaranîn *ku ye*.<sup>16</sup> Gihaneka “ku” di Kurdî de (zaravayê kurmançî) bi çend awayan tê bikaranîn ku li gorî Baran ev wekî van in; “hevokên alîkar bi yê bingehîn ve girêdide, axaftinên nerasterê bi hevoka bingehîn ve girêdide, li serê hevokê tê bikaranîn û rewşa şertî çêdike, di nava lêkernavan de tê bikaranîn û hêmanan bi hev ve girêdide”.<sup>17</sup>

*Çend nimûne ji hevokên Tirkî bo Kurdî yê ‘ku’yê dihewînin:*

Verdiğim kitabı okudun mu?

Kitêba ku min dabû te, te xwend?

Bu öğretim yılında kurs almayan öğrenciler yaz dönemi kursuna katılabirler.

Xwendevanên ku îsal neçûne fêrgehê dikarin tevî fêrgeha serdema havînê bibin.

Yazarın uzun yıllar yaşadığı ev ölümünden sonra müzeye dönüştürülmüş.

Mala nivîskarî ya ku salên dirêj lê borandiyê piştî mirina wî/ê veguherandine mûzeyê.

Büyük harcamalar yapılarak müzeye dönüştürülen ve halkın ziyaretine açık olan bu ev yazarın uzun süre yaşadığı evdir.

*(ew) Mala ku nivîskar demê dirêj lê maye ev mal e ku bi mesrefeke mezin veguherandine muzeyê û ji serdana gel re vekiriye.*

Ji nimûneyên jorê jî tê kifşê ku gihaneka *ku* şûna lêkernavên Tirkî digire.

#### 1.1.1.1. Gihanekên Lêkdayî yê bi ‘ku’yê Çêdibin

Gihaneka *ku* çî dema bi serê xwe bê bikaranîn çî dema bi peyveke din re wekî gihanekê lêkdayî bê bikaranîn, maneyên cûdar li xwe digire di hevokê de. Aydoğan hevokên ku gihanekên lêkdayî yê bi gihaneka *ku* çêbûne xistiye bin navê ‘hevokên pêreyî yê rewşî’ û ew dabeşî heft grûpan kiriye.<sup>18</sup> Gihaneka “ku” û koma gihanekên bi “ku’yê çêdibin di Tirkî de şûna hin pêvekên lêkernavan û peyv û pêvekên wekî; “-diğında, -diğî zaman, dolayı, -diğî için, -sın diye, -ması için, çünkü, -rağmen, -mesine karşın/rağmen, -den önce/sonra, -e/a kadar, -ebilir û wd. tê bikaranîn. Li jêr ji van gihanekên lêkdayî hin nimûne ew ê bîn dayîn

#### Dema/Wextê/Gava ku

Ev gihanek di wateya demê de tê bikaranîn. Ji bilî gihanekên demê “dema, wextê, gava” gihaneka ku dikare bi hin gihanekên demê yê wekî; “çax, car, lehze” re jî bê bikaranîn. Di wergera Tirkî bo Kurdî de berdêla pêvekên “-diğında, -diğî zaman” tê bikaranîn. Di hin rewşan de ev gihanekên demê beyî “ku’yê jî dikarin bîn bikaranîn. Nimûne:

16 Aydoğan, *Guman I*, 131.

17 Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmançî*, (Diyarbakir: Belkî, 2012), 122.

18 Aydoğan, *Guman I*, 150.

Buraya geldiğin zaman kitaplarımı da getir.

Dema ku tu hatî vir kitêbên min jî bîne.

### **Berî ku/Piştî ku**

Şûna “-den önce, -den sonra”ya Tirkî digire. Ev gihanek jî amaje bi demê dîkin di hevokê de.

Üniversiteyi bitirmeden önce okuyabildiğin kadar kitap okumalısın. Okul bittikten sonra yeterince zamanın ve kitabın olmayacak.

Berî ku tu zanîngêhê biqedînê divê bi qasî te kariye kitêban bixwînê. Piştî ku dibistan qediya ew ê bi têra xwe dema te û kitêbên te tunebin.

### **Ji ber ku**

Beramberî gihanekên “çünkü, dolayı, -den dolayı” yê Tirkî ye. Di hevokê de îşaretî sebebê dike. Hin caran di hevokê de “ku” dikare bikeve. Nimûne:

Kötü hava koşullarından dolayı uçaklar bugün havalanamayacakmış.

Werger 1

Ji ber ku rewşa hewayê xirab e, firoke dê nekarin îro rabin.

Werger 2

Ji ber rewşa hewayê ya xirab firoke dê nekarin îro rabin.

### **Ji bo ku/Bona ku**

Di hevokê de di wateya sebeba tiştêkî de tê bikaranîn. Di Tirkî de berdêla “için, -sın diye” tê bikaranîn. Nimûne:

Elbiseleri kırılsın diye tüm gece ayakta bekledi.

Ji bo ku kincên wî nequrçimin, îşev di êvar de şîpiya ma.

### **Dibe ku/Heye ku**

Ev herdu gihanek herdem ne hevuate ne lê wateya ihtimalê didin hevokê. Di wergera Tirkî bo Kurdî de berdêla “-e/abilir”a Tirkî ye. Nimûne:

Oldukça geç kaldılar, hava çok kötü yollar kapanmış olabilir.

Pir dereng man, hewa ne baş e dibe ku rê girtî bin.

Okurken gözünden kaçmış olabilir, bir daha kontrol etmelisin.

Heye ku ber çavê te neketibe, divê cardin kontrol bikî.

Çima ku

Ev gihanek jî wateya sebebê dide lê ji gihanekên “ji bo ku/bona ku”yê cudatir e. Beramberî gihanekên “-... diye, için”a Tirkî ye. Nimûne:

Düğüne çağırmadık diye bizimle konuşmuyor.

Çima ku me ew gazî deweta xwe nekiriye bi me re naxive.

### **Da ku**



Ev gihaneka lêkdayî di wateya boneya tiştêkî de tê bikaranîn ku egera wî tiştî diyar dike. Di vê maneyê de di Tirkî de wekî “ki” tê bikaranîn ku îhtimal e ji zimanên îranî xusûsen jî ji farisî ketibe Tirkî. Nimûne:

Sabah erkenden yola çıkmalıyız ki zamanında oraya varabilelim.

Divê em serê sibê zûtirî derkevin rê da ku em dereng nemînin.

Şûna ku/Ciyê ku/Ji dêvla ku

Ev gihanek di wateya divêtiyê de tê bikaranîn. Li şûna peyv û pêvekên “yerine, -diği yerde, iken” tê bikaranîn.

Yaptımız onca iyiliğe karşın teşekkür edecekleri yerde hiçbir şey yapmamışız gibi davranıyorlar.

Piştî ewqas qencyî ciyê ku spasiya me bikin ew wekî ku me qet tiştêk nekiriye tevdigerin.

### Ne ku

Wateya hevokê ji aliyê erênîti-nerênîtiyê ve diguhere. Zêdetir hevokê nerênî erênî dike. Dikare hevedanî jî bê nivîsandin. Nimûne:

Size hak vermiyor değilim ama yine de suçlamalarınız çok ağır bunu kabul edemem.

Ne ku ez heq nadim we lê hûn bi giranî suçdar dikin nabe ez vê qebûl bikim.

### 1.1.2. Gihanekên bê, ka û bê ka

Ev gihanekên hanê du hevokan bi hev ve girêdidin û piranî peywira pirsê li xwe digirin. Aydoğan hevokên bi van gihanekan wekî; ‘hevokên pêreyî yên pirsê’ bi nav dike û hin varyantên wan wiha dide: ‘gelo, hela, hela bê, hela ka, hela bê ka, ka gelo, hela bê ka gelo’.<sup>19</sup> Li jêr ew ê çend nimûne ji van gihanekan bê pêşkeşkirin bi rêya wergera ji hevokên Tirkî bo Kurdî.

Van’ın isminin nereden geldiği henüz çözülememiştir.

*Hêj nehatiye zanîn ka navê Wanê ji ku hatiye.*

Ne söylediğini hiç anlamıyorum.

*Ez qet/hîç nizamim bê tu çî dibêjî.*

Öğretmenin verdiği ödevi yapıp yapmadığını kontrol etmemi istedi.

*Wî xwest ku ez kontrol bikim bê ka wî spartek (sparteka mamoste-sparteka ku mamoste daye/ dayê-sparteka mamoste dayî) çêkiriye yan na.*

Van Şehrinin ne kadar güzel olduğunu şehri gezip gördükten sonra anlayacaksın.

Dema tu li nav bajêr bigerî tu dê bibînî/fêm bikî bê bajarê Wanê çiqas xweş e.

### 1.1.3. Hin Gihanekên Nerênîtiyê

Ev gihanekên ku em ê li jêr nîşan bidin dema di hevokê de bi kar tên ew wateyeke dijber li pêveberê bar dikin. Yıldırım gihanekên ‘ne, nema û neku’ wekî gihanekên xwerû û di maneya

19 Aydoğan, *Guman 1*, 137.

nerênitiyê de terîf dike.<sup>20</sup> Herwiha ev gihanek piranî têne serê hevokê.

### Nebî

Ev gihanek piranî bi wateya hişyariyê bi kar tê.

Sakın bir hata yapayım demeyin.

Nebî hûn xetayekê bikin.

Nabe<sup>21</sup>

Sonradan olan bir olay önceki bir olayın nedeni olamaz.

Nabe rûdaneke paşê bibe sedema rûdeneke berê.

Nebû

Olmazsa öyle yaparız.

Nebû em ê wisa bikin.

Nema<sup>22</sup>

Dün gece yediğim yemekten rahatsız oldum, herhalde patlıcanı bana dokundu artık patlıcan yemem bir daha.

Ez bi xwarina şevê din ketim, bawer kim bacanên wê ji min girtin, êdî nema<sup>23</sup> bacanên reş dixwim.

Ne ku

Söylediklerinize katılmıyor değilim ancak bazı kuşkularım var.

Ne ku ez ser gotinên we nînim lê hin gumanên min hene.

92

### 1.1.1.4. Wergera Dîyalogan, Bikaranîna Peyvên Alîkar ên Wekî Gihanekan di Axaftin û Dîialogan de

Peyvên ku hevokan bi hev ve girêdidin, îfadeyan vedikin, reng û şêweyekê didine îfadeyan wekî gihanek tên zanîn. Ev gihanekên ku îro ji demên berê zêdetir in û bi karanîna wan di nivîsê de berbelav in di hemî zimanên modern de peyvên krîtîk û girîng in.

Di jiyana me ya rojane de dema em diaxivin, ji bo ku axaftina xwe hêsan bikin, gotina xwe xweş bikin û îfadeyên xwe watedar bikin em hin peyv bi kar tînin ku ew peyv bi serê xwe wateya wan tune bin jî zêdetir di rola gihanekan de ne û valahiyeke girîng digirin. Hinekên wan bi eslê xwe gihanek in lê hinekên wan di peywira gihanekan de ne û zêdetir di dîyalogan de dertên pêşiya me. Em ê van peyvên ku di kurmançî de berbelav in û li gorî devokan şekl û dirûvên wan diguherin bidin nasîn, di hevokan de bi kar binin û ji bo di wergerê de girîng in em ê di wergera Tirkî-Kurdî de jî bi kar binin.

### Îja/ îca(r)/vêca

Ev peyv di eslê xwe de gihanek e. Li gorî devokan wekî ku di sernavê de jî diyar dibe formên wê yên cuda hene. Di axaftinê de berbelav tê bikaranîn lê bi qasî ku me dîtiye di nivîsê de wekî axaftinê ne berbelav e.

Îja di eslê xwe de *îca/îcar*, ew jî *ev car* e herwiha *vêca* jî wekî *vê carê* ye. Lê bi demê re wateyên

20 Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi-Kurmançî Lehçesi* (Stenbol: Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi, 2012), 285-286.

21 Ev gihanek dikare digel *kuyê* wekî *nabe ku jî* bi kar bê.

22 Ev gihanek piranî li dorwarê Amed-Mêrdînê bi kar tê.

23 Li şûna *vê* gihanekê gihaneka *hew* jî dikare bi kar bê.

din jî li xwe girtine ku wekî; ji ber vî/wî, wekî wî, wekî din, bi vî şiklî û wd. wateyên xwe hene. Ev gihanek di Tirkî de berdêla peyvên “böylece, böylelikle, bu yüzden, bu sefer, peki ” digire. Di îngilizî de jî em dikarin bêjin ku ev peyv berdêla peyva “so” ye.

#### Nimûne:

- Senin hakkında olmadık şeyler söylemişler, yönetim masum olduğuna inanıyor ama başkan konuyu araştıracağını söyledi. Tüm gün bu meseleyi konuştuk. Seni dinleyeceğini söyledi. (- *Der-heqê te de tiştên nebûyî gotine, rêveberî dizane tu mesûm î, lê serok got ew ê lêpirsînê bike. Em îro hema ser vê axivîn. Wî got ew ê guhdariya te bike.*)

Başkan mı? (-*Kî, serok?*)

Evet. (*Erê.*)

Peki sonra ne dedi? (- *Îja paşê çi got?*)

#### Ka

“ka” di kurmançî de sê peywiran digire ser xwe; yek, daçeka pirsê “ka”, duwem; gihaneka “ka”, ya din jî peyva alîkar “ka” ye û heye ku hersê jî di eslê xwe de yek bin lê niha di wateyên cuda de tînan bikaranîn. Nimûne:

1. Ka hevalê te? (daçek)

Ev peyv ku wekî “kanê” jî tê zanîn, zêdetir bi forma xwe “ku” yê tê bikaranîn. Yanî; *hevalê te li ku ye?* zêdetir likar e.

2. Ez nizanim ka ez ê çi bikim. (gihanek)

Ev “ka”ya gihanek hevmaneya gihaneka *bê* ye.

3. Ka bêjê bila neçe em bi hev re herin. (peyva alîkar)

Ev “ka” hevmaneya peyvên alîkar “ca/cê”yê ye. Li herêma Hekarî û Behdînanê *ka* û *ca* bi hev re tînan bikaranîn.

Bi biraz yana çekil de, geçeyim?

Ka xwe hinekî bide alî, derbas bim.

#### Ca /cê<sup>24</sup>

Hevmaneya peyva alîkar “ka”yê ye ku zêdetir li Herêma Serhedê berbelav e. Heye ku ji gihanekên “îca(r)/îja”yê xira bûbin. Wekî “ka”yê peyvên daxwazê ne. Dibe ku tesîra zayendê li ser van herdu forman hebe lê me têkiliyeke tam li ser nedît. Nimûne:

“–Lawo, ca çend qaydeyên mêran û began bibêje, bila begê te bibihê. Gelekî payê dengbêjiya te didin lê binihêrim ka rast e.”<sup>25</sup>

Ca deqekê bisekine.

Cê huş be ez tişteki bêjim.

#### De

24 Varyanteke bi vê maneyê li Behdînanê wekî *dê* heye.

25 Eliyê Evdîrehman, *Morof* (Amed: Lîs, 2012), 36.

Wekî “ka û ca/cê”yê zêdetir tê serê hevokê û di dîyalogan de çend cureyên wê hene. Li herêma Serhedê berbelav e. Di hevokên daxwazê de zêdetir tê bikaranîn. Nimûne:

“De bi qaydeyê doxtoriyê çawa lazim bû birîn temîz kir, şûşt, derman kir û paşê dest bi dirûnê kir.”<sup>26</sup>

De bisekine xêra te be!

Hadi, gidelim artk.

*De êdî em herin.*

### Ne

Di serê hevokê de tê bi karanîn û ji bo balê bikişîne ser tiştekî tê gotin û wek îfadeyeke baneşanî dikare bê dîtin. Nimûne:

“Ne axir ji bo dotmaman dê, bav û bira zehf şîrîn in.”<sup>27</sup>

Ne min got hûn îro mêvanê min in!

-Baban sana çok kızmış, niye geç kaldığını sorup durdu. (*Bavê te li te pir hêrs bûye, pirs ser pirsê dikir bê ka tu çima dereng mayî.*)

-Gecikebileceğimi söyledim ya!(-*Ne min go ez ê dereng bimînim!*)

-Bilmiyorum. Odasında şuan, seni bekliyor. (*Nizam. Niha li jûra xwe li hêviya te ye.*)

### Lê/Lo

Zêdetir di hevokên baneşanî de tînen bikaranîn; *lê* mêza, *lo* nêrza ye. Di dîyalogan de *lê* dikare şûna herdu zayendan jî bê bikaranîn. Nimûne:

-Seni çok kırdım, özür dilerim, beni affedebilecek misin?(*Min pir dilê te hîşt, li min bibore, tê bikarî min bibexşîn?*)

-Yok canım ya, sen bişey yapmadın. (*Na lêê, te tiştek nekir.*)

### Tişt/Ewk/Çik/Êver

Di hin zimanan de, mesela “Tirkî, Kurdî, Erebi” berbelav in. Di axaftinê de hema bêje hergav tê hewariya qisekar. Gelek caran valahiyan dadigire. Berdêla peyva “şey” a erebî ye. Wateyên nepen, girtî, şêlî, şermî bi xêra van peyvên tîne ser ziman. Nimûne:

Senin hiçbir şeyini istemiyorum.

Ez tu tiştekî te naxwazim.

Şey, affedersiniz, bişey sorabilir miyim?

Ewk, biborin, dikarim tiştekî pirs kim?

Şeyin, müdürlüğün, numarasını verir misin?

Ka nimareya çikê, kargeriyê bide min.

Ben sonra şeyi, servisi arayacağım.

Ez ê paşê êverê, servîsê bigerim.

Ji bilî van peyvên di deverên kurmançî de, di devokan de, peyvên mîna; “pa, pî, wî, da, ayja,

26 Eliyê Evdîrehman, *Gundê Mêrxasan* (Amed: Lîs), 91.

27 Evdîrehman, *Gundê Mêrxasan*, 99.

deyja, tedî, qe, ha û ww.” hene ku hinek tînen serê peyvê û hinek jî tînen dawîya peyvê. Dibe ku peyvîne din jî hebin ku di wateya peyvên jor de yan jî di wateyên nêzî wateyên wan de tînen bikaranîn. Herwiha ji van peyvên alîkar hinekên wan berbelavtir in û niha zêdetir nêzî standartê ne.

Ji bo ku em zimanê xwe yê nivîsê dewlemendtir bikin divê em ji van peyvên sûdê bigirin. Dîsa em ê bi xêra van peyvên di wergerê de jî karê xwe hêsantir bikin.

#### 1.1.1.5. Hin Hoker, Daçek û Gihanekên Tirkî û Berdêlên wan ên Kurdî di Wergêrê de

Di wergera Tirkî bo Kurdî de hin peyv an jî qalib hene gava wergera wan a Kurdî tînen kirin çewt tînen wergerandin an jî di qaliba wê ya Tirkî de tînen wergerandin. Nimûne, “bu şekilde, o şekilde, ... bir şekilde” ku çend ji van in ku wekî “bi vî şiklî, bi wî şiklî, bi awayekî...” tînen wergerandin. Ev cure werger ku di hin hevokan de lê werin jî herdem bi awayên jor ne guncaw in meriv wan wisa bi kar bîne. Em ê li jêr ji wan çend nimûneyan nîşan bikin û ji hin daçek, hoker û gihanekên Tirkî beramberî kurdiya wan nîşan bidin:

##### **Bu şekilde:** wihakî

Siz bu şekilde haklı olduğunuzu asla ispatlayamazsınız.

Hûn wihakî tu carî nikarin heqîya xwe isbat bikin.

##### **O şekilde:** wisakî

O şekilde davranarak ailenizi ve çevrenizdekileri üzdüğünüzü unutmayın.

Ji bir nekin ku hûn wisakî malbata xwe û dorana xwe xemgîn dikan.

##### **...bir şekilde:**

Kitap ayrıntılı bi şekilde incelendi.

Kitêb dahûrane hat vekolandin.

Kitêb bi hûrgilî hat vekolandin.

İşlerini uygun bir şekilde yoluna koydu.

Karê xwe bi guncanî li hev anî.

...bir biçimde:

Eşyaları doğru bir biçimde yerleştirmelisin.

Divê tu eşyayan bi tehereke rast bi cî bikî.

(Biri) olarak:

Uzun yıllar idarecilik yapmış biri olarak tecrübenizden faydalanmak istiyoruz.

*Hûn wek kesekî ku salên dirêj kargêrî kiriye, em dixwazin ji tecrubeya we sûdê bigirin.*

“Babanzade Ahmed Naim kimdir?” sualine muhatab olacak gençlerin bu ismi uzaktan bile tanımakta zorlandıklarını defaatle müşahade etmiş biri olarak söyleyebilirim ki o, “benim kendi evim” de yaşayan büyük ustalardan biriydi ki halen öyledir!<sup>28</sup>

Ez, wekî min defaaten müşahade kiriye ku ciwanên muxatabî pirsar; “Babanzade Ahmed Naîm kî ye” bûne, lê di naskirina vî navî de ketine zorê, dikarim bêjim ku ew, ustadekî mezin ê “di mala min de” bû ku hê jî wisa ye!

Haliyle:

Satış olmayınca dükkan haliyle zarar eder.

Dema ku firotin nebe dikan helbet dê zarar bike.

28 Dücane Cündioğlu, *Felsefenin Türkçesi* (İstanbul: Kapı Yayınları, 2010), 95.

Şu halde/o halde:  
Şu halde biz haklıyız ve hakkımızı alacağız.  
Wisa ye, em mafdar in û em ê mafên xwe bistînin.  
Halbuki:  
Halbuki bildiği halde gerçekleri saklıyor.  
*Hal ev ku dizane jî lê rastiyê vedişêre.*  
Rağmen/karşın:  
Tanımamasına rağmen onu takdir ediyordu.  
Çendî nas nedikir jî wî ew teqdîr dikir.  
Her çıkas nas nedikir jî wî ew teqdîr dikir.  
Çok uğraşmama karşın başaramadım.  
*Digel ku ez gelekî pê de ketim jî ez bi ser neketim.*

Meğer:  
Meğer o adamlar hırsızmış.  
Tu nabêjî ew diz bûne.  
Çima tu nabêjî ew diz bûne.  
Sözde/Güya/Sözümone:  
Sözde bana işlerimde yardım edecekti.  
Qaşo dê di karên min de aliyê min bikira.  
Güya biz arkadaştk!  
Qaşo em hevalên hev bûn.

Dolayı/ötürü:  
Havanın yağışlı olmasından dolayı trafik aksayacak.  
Ji ber hewayaya şilî hatûçû dê bi derengî keve.  
Zamanında karşılanmadığından ötürü kızmış ve uçağa geri dönmüş.  
*Çima ku di wextê xwe de nehatiyê pêşwazîkirin, hêrs bûye û ziviriye firokeyê.*

## 1.2. Hevokên Dirêj

Li gorî hevokên kurt di wergerê de hevokên dirêj zehmetir in lê zehmetî ne di kurtî û dirêjtiyê lê di kompleksbûna hevokê de ye. Dema hevokên dirêj tên wergerandin divê pêşî biker û pêveberên hevokê bên tesbîtkirin û dûre hêmanên din. Paşê divê tewtî bên wergerandin û werger yekcar wisa neyê hiştin, divê piştî maweyekê dîsa bê kontrolkirin. Li jêr em ê çend nimûneyên Tirkî wergerînin Kurdî:

Van'daki en eski yerleşme sahası, mıntkanın eski hakimleri Urartular zamanına ait olup, bu devletin merkezi Tuşba, bugünkü Van Kalesi'nin bulunduğu mahalde idi.<sup>29</sup>

Werger 1

*Li Wanê cîwarê herî kevin, aîdî dema hakimên kevin ên mintiqeyê Êratûyan e ku, navenda vê dewletê Tûşba di dorhêla/taxa Kela Wanê ya îro de bû.*

Werger 2

*"Tûşba li Wanê cîwarê herî kevin, aîdî dema hakimên kevin ên mintiqeyê Êratûyan e ku, navenda vê dewletê bû û di dorhêla/taxa Kela Wanê ya îro de bû."*

Abbasiler devrinde Doğu Anadolu'da yaşayan Mervani Devleti'nin birinci kurucusu Dostık

29 Ahmed Demir, *İslamın Anadolu'ya Gelişi* (İstanbul: Kent Yayınları, 2008), 222.

oğlu Baz, *kendisine bağlı adamlarıyla* önceleri Erciş ve çevresini egemenliği altına almış, miladi 983 yılında Diyar-ı Bekr bölgesini, daha sonra da Musul ve çevresini ele geçirmiştir.<sup>30</sup>

#### Werger 1

*Bazê kurê Dostik ê damezrînerê yekemîn ê Dewleta Merwanî, ku ev dewlet di serdema 'Ebasian de dikete Rojhilatê Anatolyayê, digel mirovên xwe pêşî Erdîş û derdora wê dixê bin serweriya xwe, di sala 983yê mîladî de herêma Diyar-i Bekr, paşê jî Mûsûl û derdora wê dixê bin destê xwe.*

#### Werger 2

*Di dema 'Ebasian de Bazê kurê Dostik ê damezrînerê yekemîn ê Dewleta Merwanî, ku ev dewlet dikeve Rojhilatê Anatolyayê, bi mirovên xwe ve pêşî Erdîş û derdora wê digire bin serweriya xwe, di sala 983 yê mîladî de herêma Diyar-i Bekr, paşê jî Mûsûl û derdora wê digire (bin destê xwe).*

Di vê hevoka dawiyê de, dikare ev bê gotin; di Tirkî de, di hevokên dirêj de, vegêrraneke bi de tay tê bikaranîn ku bi van peyv û îfadeyan mane tê xurtkirin. Ev di Tirkî de berbelav e. Bo nimûne, di hevoka dawî de îfadeya *kendisine bağlı adamlarıyla* yek ji wan e. Lê di Kurdî de ev îfade zêde nayên dîtîn û dema em îfadeyên wiha ji Tirkî werdigerînin Kurdî ne şert e em yekser wergerînin. Bona, me ew îfade wekî; *digel mirovên xwe/bi mirovên xwe ve wergerand*.

Romanları sevmek, onları alışkanlıkla okumak, mantıkla hayalgücünün, akılla gövdenin çeliştiği tek merkezli Descartesçi dünyanın mantığından kaçmak isteğine işaret eder.<sup>31</sup>

#### Werger 1

Hezkirina ji romanên, bi hîrayî xwendina wan îşaretî daxwaza revê dike ji mantiqa dinyaya Descartesparêz a yekmerkez ku di wê dinyayê de mantiq û xeyal, aqil û gewde ji hev nagirin.

#### Werger 2

Kesê ji romanên hez dike, hînê xwendina wan dibe dixwaze ji mantiqa dinyaya Descartesparêz a yekmerkez bireve ku di wê dinyayê de mantiq û xeyal, aqil û gewde nakok in.

Ayrıntıların netliği, açıklığı, güzelliği, tasvirin biz okurlarda uyandırdığı “ evet, tam böyledir, işte bu” duygusu ve metnin biz okurların hayalinde bu sahneyi canlandırabilme gücünü sevmemiz bir yazara hayranlık duymamızı sağlar.<sup>32</sup>

#### Werger 1

*Netbûna detayan, sayîbûn, rindbûn, hesta sêwrê ya ku di me xwendaran de tîne der a “erê hema wisa ye, ha ev e” û hezkirina me ya hêza metnê ya ku dikare vê sahneyê bîne pêş çavê me xwendaran, dike ku em heyranî nivîskar bibin.*

#### Werger 2

Di metna nivîskar de netbûn, sayîbûn, rindî, sêwra wê ya ku di me xwendaran de hêsta “erê hema wisa ye, ha ev e” hişyar dike û hezkirina me ya hêza wê ya ku di xeyalê me de vê sahneyê zindî dike, dike ku em heyranî nivîskar bibin.

30 Demir, *İslamın Anadoluya Gelişi*, 226.

31 Orhan Pamuk, *Saf ve Düşünceli Romancı* (İstanbul: İletişim, 2011), 29.

32 Pamuk, *Saf ve Düşünceli Romancı*, 40.

### 1.3. Hevokên Axaftina Kesê Sêyem

Veguhezîna axaftina kesê sêyem yek ji cureyên vegêrranê ye. Axaftina yekser (direct speech) dema ji zimanekî bo zimanekî din hate wergerandin zêde ne zehmet be jî di axaftina neyekser (indirect speech) de ku Aydoğan jê re gotara nerasterast dibêje<sup>33</sup>, werger bi zehmettir e. Li gorî Altinkılıç di Kurdî de ragihandina axaftina ne yekser zêde pêş neketiye û di axaftina rojane de piranî axaftina yekser tê bikaranîn.<sup>34</sup> Di beşeke vê xebatê de behsa gihaneka *ku* û peywirên wê hatibû kirin. Giringeyeke ‘ku’yê jî, di axaftina neyekser de dertê pêşiya me ku em ê li jêrê nîşan bidin.

Di axaftinê de ‘qisevan’ kesê I., ‘bihîzvar’ kesê II. e ku bihîzvar dema axaftinê kesekî din re neqil dîke li gorî dîyalogê kesê III. diguhere. Loma, dema gotina kesê yekem bi bikera ‘ez’ hate neqilkirin, eger bi xalbendiyê nehatibe jevkirin, ew kes divê wekî ‘ew’ bê veguhestin. Nimûne:

Bizimle gelmeyeceğini söylüyor.

Dibêje; “ez bi we re nayêm.”

Dibêje ku ew bi me re/ligel me nayê.

Geç kalacağını söyledi.

Wî got; “ez ê dereng bimînim.”

Wî got ku ew ê dereng bimîne.

### 1.4. Hevokên ku Biwêj an jî Gotinên Pêşyan Dihewînin

Di hemî zimanan de biwêj û gotinên pêşyan hene. Folklorê Kurdî dewlemend e û her cure hêmanên folklorê têra xwe di Kurdî de hatine honandin li ser zimanê gel. Ji van biwêj û gotinên pêşyan jî çiyekî xweser digirin. Ji ber ku kurd bi zimanê xwe perwerde nebûne, jimareke mezin ji kurdan zimanê xwe ji bîr kirine û ji bîr dikin. Di zimanekî de jî ya ku pêşiyê dimirin biwêj û gotinên pêşyan in. Di xaniyekî de îskelet çî be di zimanekî de biwêj û gotinên pêşyan ew in. Çimkî gotinên pêşyan û biwêj; nav, hevalnav, lêker, daçek û gihanekan dihewînin. Hem jî ew carna çîrok û qalibên gotinan jî dihewînin ku em dikarin bêjin xusûsiyetên ziman û çanda milletekî ya zimanê wî di van gotinan de veşartî ne.

Wekî ku tê zanîn yek ji zehmettirîn werger wergera biwêj û gotinên pêşyan e. Ji bo ku di wergerê de mane ji nivîsê muhîmtir e di wergera biwêj û gotinên pêşyan de divê di herdu zimanan de yê hevmane bîne tesbîtkirin û wisa bîne bikaranîn. Eger nehat dîtî divê qalibekî gotinê ya nêzîkê maneya wan bê dîtî û wisa bê wergerandin.

#### 1.4.1. Bikaranîna Biwêjan di Wergerê de

Biwêj, gotin û qalibên bi tesîrê ziman in. Çawa di axaftinê de ew berbelav tene bikaranîn di nivîsê de jî, xusûsen di wergerê de, divê ew bi hostatî bîne bikaranîn. Di zimanekî de çawa ku biwêjên xasî wî zimanî hene biwêjên ji zimanê din hatine girtin **û ji tesîra wan çêbûne jî hene. Bo nimûne, Zeraq dema behsa têkiliya Kurdî û Tirkî dîke ew li ser biwêjan sê kategoriyan derdixe pêş; ‘Di hin biwêjan de mantiqa herdu zimanan wekî hev e, di hinekan de nêzî hev e û di hinekan de jî bi tenê peyvek ji gotinê diguhere.’<sup>35</sup>**

Di vê xebatê de ji bo ku ew ê ji wergera ji Tirkî bo Kurdî nimûne bîne dan, nimûne ew ê ji biwêjên hevmane bin.

33 Aydoğan, *Guman 1*, 144.

34 Umran Altinkılıç, “Pirsgirêka Ragihandina Axaftinê di Romana Kurdî de”, *Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi*, ed. Mehmet Bilen vd. (Diyarbakır: Şarkiyat Vakfı, 2017), 1/52.

35 Dilawer Zeraq, *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan*, (Stenbol: Enstîtuya Kurdî, 2005), 8.



Elini eteğini çekmek  
Destê xwe jê şûştin.  
Artık bu işten elimizi eteğimizi çektik.  
Me êdî destê xwe ji vî karî şûşt.  
Pabucu dama atılmak  
Teze hatin kevin xelat in.

İkinci çocuğumuz doğduktan sonra artık herkes onu sevmeye başladı. Birincisinin pabucu dama atıldı.

*Piştî ku zaroka me ya duwem çêbû êdî herkesî jê hez kir. Ya teze hat a kevin **bû xelat**.*

*Piştî ku zaroka me ya duwem hate dinê ji ya yekem zêdetir hat hezkirin. Ya teze hat a kevin **bû xelat**.*

Dağdan gelmiş bağdakini kovuyor.

*Hat ji palê bû malxê malê.*

Bu pasajda dükkân açtığından beri ikimiz de yeterli satış yapamıyoruz. Hem benden sonra açtı dükkânı hem de kiracı, üstelik benim kapatmamı bekliyor. Dağdan gelmiş bağdakini kovuyor.

*Hingî di vê pasajê de dikan vekiriye em herdu jî têra xwe nikarin bifiroşin. Hem piştî min vekir hem jî kirêdar e, serde jî li wê hêviyê ye ku ez bigirim. Hatiye ji palê bûye malxê malê.*

#### 1.4.2. Bikaranîna Gotinên pêşiyên di Wergerê de

Ji bo gotinên pêşiyên, ji zanyarên cuda, çî di nav sînorê zimanê wan de çî wekî pênaseyên hevpar gelek pênase hatine kirin. Li gorî Çiftçi; ji bo ku gotinên pêşiyên ji aliyê watezanî, zimanzanî, huner, edebiyat û sosyolojiya civakî ve pir taybetî û fireh rehendî ne, û di çanda gel û edet û toreyan de pir karîger in, pênaseyên wan *efradê xwe camî û exyarê xwe manî* (elêmanê xwe vedigire yê ne eleman der dihêle) nînin, ew pênaseyên têkilî wan têne nûvejen kirin.<sup>36</sup> Gotinên pêşiyên, hinek eslê xwe ji kitêbên pîroz û gotinên pêxemberan, hinek ji gotinên zana û rûspiyan, hinek ji gotinên nava gel digirin<sup>37</sup> ku em dikarin bêjin di dema me de jî biwêj û gotinên pêşiyên tên çêkirin.<sup>38</sup>

Di wergerê de, dema metnên ku gotinê pêşiyên dihewînin têne wergerandin eger gotinên hevmane hebin werger bêtir rihet e lê eger neyê dîtin vê carê hewce bi agahdarkirinê heye ku gotina tê wergerandin çî ye û tê çî maneyê. Li jêr ew ê ji gotinê pêşiyên ên hevmane yên Tirkî û Kurdî ji bo wergerê çend nimûne bîne dan:

Balık baştan kokar

*Av ji serkaniyê şêlî dibe.*

Baştakiler bozulursa bu halka da sirayet eder, balık baştan kokar.

*Dema rêvebir xira bin ev xirabûn dê bigihije gel jî, av ji serekaniyê şêlî dibe.*

Dostluk başka alışveriş başkadır.

*Bira bira ye bazar cuda ye.*

36 Hasan Çiftçi, "Ortak Atasözlerinin Hikâyeleri, Farsî-Kurmançî-Zazakî", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2/3, (Mayıs 2016), 8-22.

37 Mohammad Nooruldeen Saeed, *Layenê Perwerdekirinê di Gotinên Mezinan* da, (Wan: Yüzüncü Yıl, Teza Mastirê, 2019), 22.

38 Omed Hussein Ali Ali, *Ciwankarî di Pend û Gotinên Pêşiyên de bi Mînakên Pendî Pêşinan a Şêx Mihemedê Xal de*, (Wan: Yüzüncü Yıl, Teza Mastirê, 2017), 3.

Bugün kardeşlerimizden hakkımızı alamıyoruz. Her hakkımızı talep ettiğimizde; ‘biz kardeşiz’ deyip duruyorlar. Tamam da dostluk başka alışveriş başka.

*Îro em nikarin heqê xwe ji birayên xwe bistînin. Çi dema em behsa heqên xwe dikin; hema ew dibêjin ‘em bira ne’. Erê lê; bira bira ye bazar cuda ye.*

İnsan yedisinde neyse yetmişinde odur.

*Xuyê şîrî heta pîrî.*

“Bu adamı bildim bileli hep dağınaktır, bir gün odasını topladığını görmedim. Bari evlense de hayatı bir düzene girse.”

“Bence değişen bir şey olmaz. **İnsan yedisinde neyse yetmişinde de odur.**”

*“Min ev meriv nas kiriye nekiriye hema kesekî belawela ye, min nedîtiye hê rojekê jûra xwe daye hev. Qene bizewiciya û jiyana xwe bida ser hev.”*

*“Bi ya min tiştê naguhere. Xuyê şîrî heta pîrî.”*

Su testisi su yolunda kırılır.<sup>39</sup>

*Seyê diziyê di diziyê de diçe.*

Film; katiller, uyuşturucu kaçakçıları, soyguncular ve onların yaşadığı kötü sonu konu ediniyor. Filmi izledikten sonra su testisi su yolunda kırılır diyorsunuz.

*Film; mêrkuj, tiryakfiroş, şêlbaz û dawiya wan a xirab dike mijar. Piştî filmê hûn dibêjin seyê diziyê di diziyê de diçe.*

### 1.5. Hevokên İhtimal û Texmînê

Di kurmançî de peyv û qalibên ku ihtimal û texmînê ifade dikin gelek in. Hinekên wan êdî bûne standard lê formê wan ê devokî jî hene. Ev peyv û qalibên ku berdêla peyvên Tirkî; “sanki, sanırım, sanırsın, zannederim, öyle zannediyorum ki, bana öyle geliyor ki, -yor olabilir, -dır/-dir, herhalde, galiba” û ên din in, di kurmançî de; “heçko, qey, ez dibêm, ez dibêm qey, tu dibê qey, min wetirê/ji min werê, barkim/barkem (ez bawer dikim), dibe ku, heye ku” û ên wekî wan in. Dema bi van peyvên navborî hevokên tîn sazkerin ew hevok bi peyvên ihtimalê wekî hevokên ihtimalê û bi peyvên texmînê jî wekî hevokên texmînê tîn binavkerin. Dîsa divê bê zanîn ku ev peyv; di hevokê de di peywira gihanekê de ne. Em ji her yekî nimûneyek an çend nimûneyan bidin:

#### Dibe

Yarın işe biraz geç gelebilirim.

Dibe sibê ez piçekî dereng bimînim.

Dibe ku

Biraz daha beklileyim işlerini henüz bitirmemiş olabilirler.

Em hinekî din jî bisekinin dibe ku karê xwe neqedandibin.

Heye ku

Heye ku ez şaş im, lê bi qasî ku ez dizanim û min dîtiye, însanê herî têgihiştî û zana yê hemû welatê Cizîra Botanê, Mam Sefo bû.<sup>40</sup>

39 Di vê gotinê de; ya Tirkî hem di wateya erênî hem jî di ya nerênî de dikare bê bikaranînê. Lê ya Kurdî zêdetir ji bo wateyên nerênî dikare bê bikaranînê.

40 Mehmed Uzun, *Hawara Dicleyê* (Stockholm: Nefel, 2003), 38-39.

Bizi tanımamış olabilirler ya da tanımazlıktan gelmiş olabilirler.

Heye ku em nas nekiribin an jî xwe nenasiyê danîbin.

Heçko

Sanki onun ne biçim biri olduğunu bilmiyorsun!

Heçko tu nizanî bê ew çi terî meriv e!

Ez dibêm

Durumu çok iyi, bu çocuğa küçük bir yardımda bulunur sanıyorum.

Rewşa wî pir baş e, ez dibêm ew ê alîkariyeke biçûk bide vî lawikî.

Tu dibê qey/ez dibêm qey

Ev gihanek; dema qesta kesê yekem be wekî; “ez dibêm qey” lê dema qesta kesekî din be wekî; “tu dibê qey” tê bikaranîn. Nimûnek:

*Öyle üzgün öyle çaresiz ki zannedersin dünya başına yıkılmış.*

Wisa xemgîn wisa bêçare ye ku tu dibê qey dinya ser de xira bûye.

Sanırım okullar bu sene Ocak ayının ikinci haftasında tatil olacak.

Ez dibêm qey dibistan îsal dê hefteya duwem a meha Çilleyê bikevin betlaneyê.

Min wetirê/ji min werê

Bana öyle ters ters baktı ki o an bana saldıracak zannettim.

Avirên wisa dane min, min wetrê ew ê hema êrişî min bike.

Barkim/barkem (ez bawer dikim)

Galiba başvuruyu senden önce yapmıştı.

Barkim wî/ê berî te serlêdana xwe kiribû.

Li jor wekî ji mînakên jî diyar dibe di kurmançî de gihanekên îhtimal û texmînê û hevokên bi wan tînan sazkerin gelek in û li gorî sazkerina hevokê jî dikarin maneyên cuda li xwe bigirin. Di wergera Tirkî bo kurmançî de jî dema me hevokên wisa wergerandin divê peyv baş bîn bijartin û ji ber ku wateyên gihanekên navborî nêzî hevî divê tewtiya hevokê bê nêrîn û li gorî wî gihanek bê bijartin û wergerandin.

## 2. Cînava Heçî

Cînav ew beşa axaftinê ye ku cihê navdêrekê digire ku di axaftinê de qala wê hatiye kirin.<sup>41</sup> Cînava *heçî* dikeve nav koma cînavên nebinavkirî<sup>42</sup> yan jî nediyar<sup>43</sup>. Li gorî Celadet û Lescot ev cînav ji morfemên ‘her+çî’ pêk hatiye û ew, wê hem wekî hevalnav û hem jî wekî cînav qebûl dikin.<sup>44</sup> Cînava *heçî* di hevokê de şûna kesan digire û îfade hem pê hêsantir dibe hem jî di hin rewşan de îfadeyê kurttir dike. Loma divê di wergerê de berbelav bê bikaranîn. Çend nimûne:

İsmi listede olmayanlar isimlerini yazdırsınlar.

*Kesên ku navên wan di listeyê de tunene bila navê xwe bidin nivîsandin.*

41 Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî* (Stenbol: Enstîtuya Kurdî, 2011), 121.

42 Nezir Öcek, *Rêzimana Kurmançî* (Stenbol: Sîtav, 2014), 134.

43 Baran, *Rêzimana Kurmançî*, 92.

44 Celadet Bedirxan, Roger Lescot, *Kürtçe Dilîgisi-Kurmançî* (Stenbol: Doz, 2011), 268.

An jî;

Heçiyê navê wan di lîsteyê de tunene bila navên xwe bidin nivîsandin.

Belediye; suyu olmayan köyler için başvuruları alıyor, bu yüzden başvuru yapmayan köylerin bir an önce başvurularını yapmaları gerekiyor.

*Şaredarî; ji bo gundên ku avên wan tunene serlêdanan digire, ji ber wî gundên ku serî lê nedane divê zûtirî serî lê bidin.*

An jî;

*Şaredarî; ji bo gundên bêav serlêdanan digire, ji ber wî heçiyê serî lê nedane divê zûtirî serî lê bidin.*

### ENCAM

Werger karekî girîng e ku niha di jiyana sosyal û xusûsen jî ya akdemîk de çî devkî û çî nivîskî be ciyekî girîng digire. Di wergerê de zimanê jêder tê wergerandin bo zimanê armanc. Çendî sedî sed wergera rasterast ne mimkun be jî ji bo ku di herdu zimanan de jî eynî tam hebe divê wergêr baş lê hûr be. Herdu zimanan jî baş bizane û materyalên bin destê wî amade bin. Wergêr ji bo wergereke baş bike divê ecele neke, heta dikare wergera xwe nîşanê hin kesên din bike û fikra wan jî bigire. Herwiha dema wergera xwe kir eger ji wergera xwe qanî nebû divê demek şûnde dîsa lêvegere û cardin kontrol bike.

Ji ber rewşa duzimanî ya kurdan, werger di jiyana wan de her hebûye, xusûsen kurdên merûzî Tirkî mane hem wekî îhtiyac hem jî wekî mecbûriyet wergera ji herdu zimanên Kurdî û Tirkî bûye perçeyeke ji jiyana wan.

Wergera ji Tirkî bo Kurdî hinekî zehmetir e ji ber ku mantiqê wan ji hev cuda ne. Lê di her hevokî û di her nivîsî de em nikarin vê bêjin. Çunkî di hemî zimanan de jî qalib, mantiq û maneyên hevpar hene. Zehmetî zêdetir di hevokên dirêj û kompleks û maneyên girtî de ye. Dema me ji Tirkî metnek wergerande Kurdî, ya zor li ber me paşgirên Tirkî yê navdêrandinê ne ku di Kurdî de beramberî wan ji bilî hin lêkernavan daçek, gihanek û hin peyvên alîkar hene.

Li aliyekî din; hevokên kompleks, hevokên pêwendiyê, hevokên dirêj û yê biwêj û gotinên pêşiyar dihewînin, di hevokên wisa de, divê em peyvên krîtîk baş bi kar bînin û divê em ji peyvên zêdetir wateyê bigerin. Dîsa di dîialogan de jî divê em peyvên alîkar rast bi kar bînin. Eger wate rast derkeve ne peyveke hemwate lê peyveke nêzwate jî carna dikare şûna peyva zimanê jêder bigire. Yek jî di devokên Kurdî de peyv hene ku kêmtên zanîn an jî ne berbelav in. Di zimanê standart de eger em bikarin wan di cî de bi kar bînin em ê hem dewlemendiya zimanê xwe keşf bikin hem jî em ê di wergerê de karên xwe hêsan bikin.

Di vê nivîsara xwe de me bal kişand ser wergera ji Tirkî bo Kurdî û digel hin varyantên wan ên deverî peyv û qalibên Kurdî yê ji bo wergerê girîng me pêşkeş kirin. Em wisa hêvî dikin ku ev peyv û qalib û awayê bikaranîna me ya di nimûneyan de ew ê bibe alîkar heçiyê ku karê wergerê re mijûl in çî ya nivîskî çî jî ya zarî be.

### JÊDER

Ali, Omed Hussein Ali. *Ciwankarî di Pend û Gotinên Pêşiyar de bi Mînakên Pendî Pêşînan a Şêx Mihemedê Xal de*. Wan: Yüzüncü Yıl, Teza Mastirê, 2017.

- Altınkılıç Umran. "Pirsgirêka Ragihandina Axaftinê di Romana Kurdî de". *Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi*. ed. Mehmet Bilen vd. Diyarbakır: Şarkiyat Vakfı, 2017.
- Aydoğan, İbrahim Seydo. *Guman-1*. Ankara: Lîs, 2013.
- Baran, Bahoz. *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Belkî, 2012.
- Boztaş, İsmail. "Çeviri, Çevirmen, Dilbilim İlişkisi, Çeviride Eşdeğerlik ve Kayıplar". *Hacetepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*, 10/2, (Aralık 1993), 55-65.
- Bedirxan, Celadet - Lescot, Roger. *Kürtçe Dilbilgisi-Kurmancî*. Stenbol: Doz, 2011.
- Cündioğlu, Düccane. *Felsefenin Türkçesi*. İstanbul: Kapı Yayınları, 2010.
- Çetinkaya, Serkan. *İkidillilik ve Çeviri*. İstanbul: İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Çeviribilim Anabilim Dalı, Yüksek Lisans Tezi, 2015.
- Çiftçi, Hasan. "Ortak Atasözlerinin Hikayeleri, Farsî-Kurmancî-Zazakî", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2/3, (Mayıs 2016), 8-22.
- Çoraylı, Oya. *Farklı Metin Türlerinin Çevirisinde Karşılaşılan Sorunlara Eleştirel Bir Bakış*. Sakarya: Sakarya Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yüksek Lisans Tezi, 2008.
- Demir, Ahmed. *İslamın Anadoluya Gelişi*. İstanbul: Kent Yayınları, 2008.
- Evdirehman, Eliyê. *Gundê Mêrxasan*. Amed: Lîs, 2012.
- Evdirehman, Eliyê. *Morof*. Amed: Lîs, 2012.
- Güzel, Şerif. *Lêkolîneke Sentaksî li ser Berhema Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan*. Muş: Muş Alparslan, Enstituya Zanistên Civakî, Teza Mastirê, 2018.
- Munday, Jeremy. *Introduction Translation Studies-Theories and Applications*. London and Newyork: Routledge, 2001.
- Newmark, Peter. *A Textbook of Translation*. Newyork: Prentice Hall, 1988.
- Pamuk, Orhan. *Saf ve Düşünceli Romancı*. İstanbul: İletişim Yayınları, 2011.
- Öcek, Nezir *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Sîtav, 2014.
- Saeed, Mohammad Nooruldeen. *Layenê Perwerdekirinê di Gotinên Mezinan da*. Wan: Yüzüncü Yıl, Teza Mastirê, 2019.
- Tan, Samî. *Rêzimana Kurmancî*. Stenbol: Enstîtuya Kurdî, 2011.
- Uzun, Mehmed. *Hawara Dicleyê*. Stockholm: Nefel, 2003.
- Yıldırım, Kadri. *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi-Kurmancî Lehçesi*. Stenbol: Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi, 2012.
- Yıldırımçakar, Ziyattin. *Werger Wek Kirineke Çandî -Li Ser Riyên Ji Wergernasiyê Ber Bi Kurdo-lojiyê Ve*. Mardin: Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanên Jîndar, Teza Lîsansa Bilind, 2016.
- Yıldız, Ayhan. *Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî -1*, Wan: Lorya, 2017.
- Zeraq, Dilawer. *Deyimler Sözlüğü-Ferhenga Biwêjan*. Stenbol: Enstîtuya Kurdî, 2005.